# Avabûn

## Eyûb Reşîd Nisrî

**Ka destên xo**
**Da tilên min ji dil bimêjin**
**Li şehyana**
**Aşopa du evîndaran**
**Semayê biken**
**Da hestên min yên aryayî**
**Bi vê semayê hawîş bibin**

***  *  ***

**Roj ya xo vedşêrît**
**Ditirsît ronahîya wê**
**Vê dîtina me**
**Bikete qaçkê devê xelkî**
**şûna kuçkên balavîyan**
**Li ser şaşên mubaylan**
**Bilutos pê mijûl bibin**

***  *  ***

**Avabûn**
**Ew firîşteya çakîyêye**
**Dê di nav perdên tarîyê da**
**Hêlînekê bo me çêket**
**Da em di nav da xinê bibîn**
**Min divêt ez jî wekî rojê**
**Di asoyê çavên te da**
**Ava bibim**
**Bihêle da di nav mijûlankên te da**
**Bo cara dumahîyê**
**Avrîyekê li cîhana xemên xo bidem**
**êdî biçim li cîhana hezên xo tena bibim**

***  *  ***

**Avabûn**
**Dumahîya serhatîyeka xemnake û**
**Beref cîhana Bextiyarîyêye**
**Were tu jî**
**Di asûyî çavên min da**
**Ava bibe**
**Li nav beheşta dilê min da aram bibe**